Kompetansesenteret
Tannhelse Midt



# Yekemîn serdana li klînîka diranan

Yekemîn serdana li klînîka diranan dikare hem balkêş be û hem jî hinekî ecêb be, ji ber ku em cara yekem li diranan dinihêrin.

## Amadekarî

Divê zarok di kontrolkirina diranan de ji bo tiştên ku wê biqewimin amadekariyê bike. Beriya serdanê, baş e ku zarok li ber neynikê devê xwe fireh veke, wekî ku hûn diranan dihejmêrin. Ji wan re qala kursiyê, çirayê û neynika biçûk a ku ji bo kontrolkirina diranan tê bikaranîn bikin. Herwiha dibe ku pêdivî bi bikaranîna sonda diranan hebe ku di serdana yekem de hinekî nava diranên xwe bibin û bînin.

## Ewlehî

Ev serdan dê bingeha pêwendiyeke pêbawer be ku divê di hemû jiyanê de berdewam bike, û karmendên beşa diranan dê hemû hewlên xwe bidin da ku kontrolkirina diranan ji bo her kesî ezmûneke erênî be.

Zarok dê mixateb be û dayîkbav dê pê bihesin ku pisporên tenduristiya diranan dê di destpêkê de rasterast bi zarokê re biaxivin. Ew ê bihêlin ku wexteke bi qasekî baş bipeyivin da ku bawerî li ser şert û mercên zarok ava bibe.

Eger kesê ku bi zarok re tê, di derbarê serdana pisporê paqijiyê/bijîşkê diranan de xwedî reftareke aram be, ew jî dê alîkariyê bike ku hesta ewlehiyê bide zarokê. Beriya serdanê bi klînîka diranan re têkiliyê dayînin û ji wan re bibêjin ka zarok bi taybetî negîran e yan na. Bi hev re hûn ê hingî bikarin rêya herî baş ji bo zarokê bibînin.

## Tenduristiya diranan a zarokê

Ji bo tenduristiya baş a diranan bê parastin hûn ê li ser tiştên ku divê werin kirin agahî û rêberiyê wergirin. Ew berpirsiyariya beşa xizmeta diranan a giştî ye ku ser çawa baş pêkanîna vê erkê rê li we nîşan bide.

Bipirsin ka tiştek heye ku hûn meraq dikin - her pirsgirêka mezin an biçûk ser tenduristiya diranên zaroka we de. Der heqê nexweşî, derman an jî tengasiyên xwarinê de me agahdar bikin. Ev yek dikare bandorê li tenduristiya diranan bike.